



Navendên Kombûnê

GUHERTINA XIZMETAN JI BER BELAVBÛNA NEXWEŞIYA KOVÎD-19'ê

Raberkirina Piştewaniyê di bin bernameya navendên Kombûnê (Community Hubs) di serdema belavbûna KOVÎD-19'ê da hema wisa jibo seredaneran pêkan e. Tevî vê yekê, gengaz e ku şêwaza raberkirina xizmetan li gorî şîretên fermî yên Tendurustiyê were guhertin.

Di pirranya mekanên têkildarî van navendan da, têkiliyên rasterast û amadeyî kêm bûne. Berpîrsên van navenda bi riya telefonê digel her yek ji seredaneran dikevin têkiliyê. Civînên komkî bi awayê Online dê cih bîn û piştrastî û dilniyayî pêk tê ku civat têkiliya xwe tev berpîrsên van navendan, her wiha digel hevdu diparêzin û hema wisa beşdarî çalakiyên girîng weke polên axaftina Ingilîzî dibin.

Derbarê **KOVÎD-19'ê û nîşaneyên wê agahiyên bi dest bîne.**

Navendên kombûnê çî ye?

Navendên Kombûnê (her wiha wek Bernameya Navendên kombûna Neteweyî (National Community Hubs Program) jî tê naskirin), hin mekan jibo wergirtina malbatên koçber û penaber, nemaze wan dayîkan e ku zarokên wan ên biçûk hene.

Navendên Kombûnê li dibistanên seretayî ne û di warê hînbûna zimanê Ingilîzî, geşepêdana pisportiyên nû, peydakirina şolê û bidestxistina xizmetên piştewaniya dewletê alfkariya xelkê dikin.

Navendên Kombûnê li kî derê ne?

- NSW: Parramatta, Blacktown, Canterbury Bankstown, Fairfield, Cumberland, Wollongong, Liverpool
- VIC: Brimbank, Dandenong, Hume, Banyule, Geelong, Shepparton
- QLD: Logan, Ipswich
- Australyaya Başûr (SA): Port Adelaide – Enfield, Salisbury

Tu dikarî lîsteya dibistanên seretayî ku tê da navendên Kombûnê hene û lêzanînên têkiliya bi wan ra li **vir** bibînin.

Navendên Kombûnê çî cûre xizmetan raber dikin?

Bi mebesta piştrastî û dilniyabûn ji dabînkirina hewcetiyan civatên xwecihî yên wan, xizmetên raberkirî li navendên Kombûnê ciyawaz in. Hin nimûne ji cûreyên van çalakiyan ev in:

- Bernameyên têkildarî dewrana seretayî û komên lîstinê
- Bernameya axaftinê û polên Ingilîzî

- Şêwaza jiyana saxlem û kom û komxebatên din ên têkildarî pisportiyên Jiyanê
- Bernameyên derfetçêkirinê û danûstandina dêbavan
- Bernameyên hînbûnê û bernameyên zimanî jibo zarokan
- Piştevaniyên karî û derfetên xwebexş û dilxwazî
- Fêrkirina fermî ya profesiyonal bi hevkarîya 'TAFE' û rêxistinên perwerdehiyê yên tomarbûyî
- Kargehên geşepêdana pisportiyên ne-fermî
- Komên civakî û xwedî-berjewendiyên taybet
- Gerrên zanistî û komî
- Lêvegera bo bernameyên din ku dikarin jibo çareserkirina meseleyan alîkar bin

Gelo ez xwedan-mercê wergirtina van xizmetan im?

Navendên civakî hemî koçberan dipejirînin. Dayîkên koçber ku zarokên wan hene, di van xizmetan da bi awayekî taybet tî berçavgirtin.

Ez çawa dikarim derbarê xizmetên navendên Kombûnê lêzanînên zêdetir bi dest bixim?

Jibo wergirtina lêzanînên zêdetir seredana malpera **Navendên Kombûnê** bike, an digel vê hejmarê bikeve têkilliyê: 03 8614 3430.